

Agahdarî derbarê erkê girêdana maskê

Ji roja 27ê nîsana 2020an ve hemî kesên, ku temenê wan di ser 6 salan re be, divê maskekê li pêşiya dev û bêvila xwe girêbidin (maskeke normal)

- Li dema kiriyarê li Dikanan
- Li Otubusan, trênen nava bajêr yan di tirênen din de

Erkê girêdana maskê ji bo wan kesan NÎNE, ew kesên, ku ji ber sedemên tenduristî nikarin maskê deynin ber dev û bêvila xwe (Ji Textorê xwe bipirse, taku belgeyekê ji te re binivîsîne!).

Kesên, ku ji ber kêmendamiya xwe nikarin maskan deynin ya ji ber devê xwe bikin yan mirovên kerr bin, ew NE mecbûr in maskê deynin ber dev û bêvila xwe.

Têbinî û şîret derbarê girêdana maskan li dema Korona de **Divê ez çi maskê bi kar bînim?**

Destmalek normal ji bo danîna ber dev û bêvilê wê baş e. Tu dikarî destmaleke qirkê yan destmaleke seriyên li pêşiya dev û bêvila xwe girê bidî.

Çima ez mecbûr im vê maskê bi kar bînim?

Ev mask dibe alîkar, taku mirovên din ji te nekevin. Ev mask dibe wek mîna sînorekî yan dîwarekî: ew nahêle, ku ava dev û bêvila te li dema axaftinê, kuxîne û pişkîne bighîje mirovên din.

Maskên cawyî, ku mirov xwe bi xwe çêkirîn, maskên emaliyatan (maskên yakarî) û maskên nîvnîvî (FFP2 û FFP3), hemî bi kêr tên û baş in.

Baş e û beraqil e, ku mirov maskê bi kar bîne, herçende ku tu diyardeyên nexweşîne li ba mirov nebin jî.

GIRING!

Rêbazên paqijiyê û parastinê yên ku heta niha misogir in, divê mirov hîn berdewam wan bişopîne û hay ji wan hebe. Parastina dev anku mask, parastineke TEMAMKER e ji bo tedbîrên parastinê yên din!

Mask NE parastineke serê sedî sed e ji bo pêşlêgirtina pêketinê!

Dema ku ez maskê bi kar bînim, divê ez hay ji çi hebim?

- Ji kerema xwe re berî ku tu maskê ji ber xwe bikî hergav destên xwe bişo.
- Dema ku tu maskê deynî ber dev û bêvila xwe destên xwe **nede** hundirê maskê.
- Her gav raje **lastîkên** maskê bi tenê.
- Divê mask **bêvilê û dev û hinekî ji alguşkan** bigire.
- Divê mask **teng li ser rû were girêdan**.
- Divê mirov karibe dibin maskê de **baş bihîna xwe bibe û bîne**.
- Dema ku mask li ber dev û bêvila mirov girêdayî be, çênabe mirov destên xwe bide rûyê xwe û maskê.
- Heger mask şil bû, divê mirov wê ji ber xwe bike û yeke ziwa bi kar bîne.

Piştî bikaranînê

- Divê mirov maskê **bi tenê bi alîkariya wan lastîkên wê ji ber xwe bike**. Çênabe mirov destên xe bavêje cawê maskê bi xwe.
- Maskên ku mirov bi kar anîn, divê mirov heta dema şuştina wan, wan bike tûrekî lastîkî devgirtî.
- Divê mirov maskan **bi kêmanî li ser dereca 60 ° heta 95 ° di beroşê de yan di makîna cilşuştinê de bişoye**.
- Divê mirov bi tenê maskên şuştî û baş ziwabûyî bi kar bîne.

Gelo ez mecbûr im hêdî ceza bidim, heger ez maskê ne deynim ber dev û bêvila xwe?

Erkê girêdana maskê ji roja 27ê nîsana 2020an ve dest pê dike. Ji roja 04ê gulana 2020an ve dayirên dewletê li herêma Baden-Württemberg dikarin mirov ceza bikin, heger hate isbat kirin, ku mirov erkê hilgirtina maskan bin pê kiriye.

Tu dikarî agahdariyên derbarê rêbazên paqijyê û parastina ji pêketina bi nexweşiyê li ser vê malperê peyda bikî

<https://www.mannheim.de/de/informationen-zu-corona/allgemeine-hygienemassnahmen-infektionsschutz>